
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1278 1-Pûşper-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Em bi feraseta çanda resen, çanda nûjen diafirînin’

Dîlan Mulhim\Qamişlo

**Endama Hîlala Zêrîn a Şehbayê Guneyî Mistefa diyar kir ku li Şehbayê 7 sal in kar û xebatên Hîlala Zêrîn tê meşandin. Herwiha gelek komên wan yên xweser hene weke koma Şano, Govend, Amûran, Şehîd Hêva û hwd... Ev kom bi ruhekî fedayî xebatên xwe birêve dibin û got, “Em bi feraseta çanda resen, xebatên çanda nûjen didin meşandin.”**



Tevgera Hîlala Zêrîn di sala 2015’an de li çiyayên Kurdistanê hatiye avakirin, herwiha di 2016’an de li herêma Cizîrê, di 2017’an de li herêma Efrînê û di 2018’an de li kantona Kobanê hatiye avakirin. Her ku şoreş mezin bû, Hîlala Zêrîn jî xwe berfireh kir û li tevahî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe bi rêxistin kir. Niha li tevahî kanton û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî fermî navendên Hîlala Zêrîn hene û di wan navendan de bi dehan kar û xebat tên meşandin. Jin di qadên hunerî de bûne xwedî tecrube û gelek ji wan jinan niha cihên xwe di nava govend, koma muzîk, şano, çîrok, helbest, wênexêzî, dengbêjî, pargîn û nivîskariyê de digrin.

Di derbarê kar û xebatên Hîlal Zêrîn a Şehbayê endama Hîlala Zêrîn a Şehbayê Guneyî Mistefa ji Rojnameya me re axivî.

**‘Me ji tunebûnê hebûn ava kir’**

Guneyî Mistefa eşker kir ku li Şehbayê heft salan kar û xebatên Hîlala Zêrîn meşandiye û wiha got: “ Li Şehbayê heft salan li gorî derfetên di nava destê me de kar û xebat hatin meşandin. Di nava wan her heft salan de komên herî serkeftî derketin, ruxmî hemû astengî û zehmetiyan me dev ji çand û hunera xwe berneda. Herwiha em bi feraseta çanda resen, çanda nûjen diafrînin. Dema ku em ji Efrîn derketin me êş û zehmetiyeke pir mezin dît, lê bi riya çand, huner û nasnameya xwe ew êş û zehmetî bi demê re hatin jibîrkirin. Em bi riya stranbêjiyê çîrokên xwe tînin ziman û hertim em xwe di nava civak û cîhanê de didin diyarkirin. Da ku nasnameya me neyê windakirin em bi rêya stranan xwe zindî dikin. Gelek komên me yên xweser hene weke koma Şano, Govend, Amûran, Şehîd Hêva û hwd. Tevlî hebû zehmetiyên ku me li Şehbayê dikşandin lê me karê xwe berdewam dikir û me ji tunebûnê hebûn ava kir.”

**‘Bi riya hunerê em hewldidin çand û kelepora gel bighînin cîhanê’**

Guneyî Mistefa da zanîn ku rojana hejmara endamên Hîlala Zêrîn a Şehbayê zêde dibûn û wiha berdewam kir: “ Weke tê zanîn her tim çalakiyên me berdewamin û hezkirineke mezin di navbera me û çandê de heye. Hîlala zêrîn bi riya şano û hunera xwe hewl dida ku çanda civakê vebêje, bi armanca ku çand û hunera xwe ya resen bighîne tevahî cîhanê kar û xebateke bê navber tê meşandin. Endamên me bi giştî temenên wan biçûkin û xwendekarin, lê kar û xebatên wan bi awayekî serkeftî tê meşandin. Herwiha piraniya endamên koma Şehîd Hêva weke mamoste derbasî peyîmangeha Hîlale Zêrîn a Şehbayê bûn û niha di asteke pir baş de fêrî çand û hunerê dibin. Koma Şehîd Hêva ji 14`kesan pêk tê û bi rihekî fedayî xebatên xwe birêvedibin. Dema ku em ji Şahbayê derbasî kantona Cizîrê bûn Koma Şehîd Hêva li bajarê Qamişlo tevlî gelek şahiyan bû weke cejina Newroz, 8`ê Adarê û 4`ê Nîsanê di van şahiyan de gelek stran pêşkêşkirin. Herwiha koma Şehîd Hêva 11`ê Gulanê jî şahiyek bi heybet lidarxist.”

Endama Peymangeha Hîlala Zêrîn Guneyî Mistefa axaftina xwe wiha bi dawî kir: “ Em zarokan li ser stran û şanoyê perwerde dikin. Deriyê Hîlala Zêrîn ji jin û zarokên hemû pêkhateyan re vekiriye û rojane pirovayên me hene. Em bang li her dayîkekê dikin ku çanda kurdî bi zarokên xwe bidin naskirin û hezkirin da ku em çanda xwe biparêzin û di nava civakê de belav bikin.”



# Şoreş hunera Kurdî bi hêz kir

Navenda Nûçeyan

**Hunera jinên Kurd, bi êş û hêviyê hatiye hunandin. Beriya Şoreşa Rojavayê Kurdistanê gelek tişt qedexe bûn. Nedihiştin ku jin di xebatên hunerî de bixebitin û bi taybetî gelê Kurd di vî warî de rastî qedexeyan dihat. Piştî şoreşa ku bi pêşengiya jinan çêbû, di gelek qadan de jinan xwe bi pêş xist, bi taybetî jî di qadên siyasî, civakî û hunerî de.**



Sumeya Mihemed ku ji zaroktiya xwe de ji hunerê hez dikir, beriya Şoreşa Rojava kar û xebatên xwe yên çand û hunerê bi awayekî veşartî didomand. Sumeya di gelek koman de cihê xwe girtiye. Hunermend Sumeya Mihemed derbarê kar û xebatên xwe yên çand û hunerê de ji ajansa me re axivî.

**‘Gotin divê tu bi zimanê erebî bêjî’**

Sumeya Mihemed derbarê kar û xebatên xwe yên çand û hunerê yên beriya Şoreşa Rojava de wiha got: “Ez wek hunermend di nava malbatek welatparêz de mezin bûme. Ji zarokatiyê ve hezkirina min ji hunerê re hebû. Em çiqas bînin ziman wê kêm bimîne. Helbet gelek zor û zehmetî hebûn. Ev kar û xebatên ku min jê hez kir bi taybetî muzîk û stranbêjî, beriya Şoreşa Rojava hîn ew di bin zimanê me de ye. Çiqas zor û zehmetî hebûn. Bi taybetî ji bo jinan. Ji 7 saliya xwe ve min pir ji muzîkê hez dikir û dixwest bistrêm. Dema diçûm dibistanê, mamosteyên min digotin tevlî pêşbirkê bibe. Ji ber ku beriya şoreşê bû, em di dibistanên rejîmê de bûn. Zora min dihat dema digotin tuyê ne bi zimanê xwe bêjî. Ji ber ku zimanê Kurdî qedexe bû di wê demê de. Digotin tuyê bi zimanê Erebî bêjî. Tiştê herî pîroz ji bo me Newroz bû, 8’ê Adarê bû, 15’ê Tebaxê bû û 28’ê Mijdarê bû. Min haziriya wan rojan dikir.”

**‘Hêviya me pir mezin e’**

Sumeya Mihemed behsa êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser bajarê Serêkaniyê kir û wiha anî ziman: “Di sala 2019’an de êrîşên dewleta Tirk a dagirker li ser bajarê Serêkaniyê çêbûn. Gelek kes koçber bûn, lê gelek mirovan jî terka axa xwe nekirin. Hêviya me pir mezin e, rojek were em ê vegerin bajarê xwe. Em karê xwe wek beşa rêxistinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê didomînin û hunera xwe jî berdewam dikin.”

Sudoku: Bersiv 42

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 2 | 3 | 8 | 7 | 6 | 9 | 5 | 1 |
| 7 | 8 | 6 | 9 | 5 | 1 | 4 | 2 | 3 |
| 5 | 1 | 9 | 2 | 3 | 4 | 8 | 7 | 6 |
| 6 | 3 | 1 | 5 | 4 | 8 | 2 | 9 | 7 |
| 2 | 7 | 4 | 3 | 6 | 9 | 1 | 8 | 5 |
| 8 | 9 | 5 | 1 | 2 | 7 | 3 | 6 | 4 |
| 3 | 6 | 7 | 4 | 8 | 2 | 5 | 1 | 9 |
| 9 | 4 | 2 | 7 | 1 | 5 | 6 | 3 | 8 |
| 1 | 5 | 8 | 6 | 9 | 3 | 7 | 4 | 2 |

Sudoku:Pirs 43

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | 6 | 7 | | | 1 |
| 6 | 2 | | | | 1 | | | 4 |
| 1 | | 8 | | | 3 | | 6 | 5 |
| | | 2 | | | | | | |
| | 7 | 1 | | | | 3 | 2 | |
| | | | | | | 4 | | |
| 7 | 4 | | 3 | | | 5 | | 2 |
| 2 | | | 5 | | | | 1 | 3 |
| 3 | | | 6 | 9 | | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER MÊRXASIYÊ**

**Berxê nêr ji bo kêrê ye:**
- Dema yek di şerê neyarê xwe de tê kuştin hingê tê gotin.

**Birhên wî sê tiliyan dirêj bûn:**
- Mêrxas bû; biheybet bû.

**Çavên wî naşkin:**
- Weke şêrekî ye; qet natirse.

**Çavên xwe ji kelem nagire:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên xwe ji kulê nakudîne:**
- Ji ti tiştî natirse; mêrxas e; dînemêr e.

**Çavên xwe naşkîne:**
- Weke şêrekî ye; qet natirse.

**Çavên xwe ji tiştekî naşkîne:**
- Bi heman wateyê.

**Çeka wî li erdê nehişt/nehêla:**
- Cihê wî dagirt; cihê wî tijî kir.

**Du mûyên Melkemot li ber çavê wî bûn:**
- Mêrxas bû; biheybet bû.

Kincê xas mirov nake mêrxas
- Mêrxasî û jîrbûn ne bi cilan e.

**Pezê nêr ji bo kêrê ye:**
- Dema yek di şerê neyarê xwe de tê kuştin hingê tê gotin.

**Te hê çavên zerdoq di nava kayê de nedîtine:**
- Te hê mêrxas nedîtine.

Ti kes nikare çavên wî bişkîne
- Mêrxas e.

**Tiştek çavên wî naşkîne:**
- Bi heman wateyê.

**Xwîna wî li erdê nehişt/nehêla:**
- Tola wî stand; tola wî hilanî; heyfa wî sand; bikujê wî kuşt.

**LI SER KARÊ NE DI CÎ DE**

**Berx teslîmî gur kiriye:**
- Teslîmî cihekî nebaş kiriye.

**Ev ji me kêm bû/jixwe ev ji me kêm bû:**
- Ev tişt ji bo me nabe; ji bo me şerm e; ne li gorî me ye; li me nayê.

**Gayê li nava golikan e:**
- Dema yekî bi temen di nava xortan de karekî dike, yan bi wan re dilîze jê re tê gotin.

**Gayê di nava golikan de ye:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER NÎŞANÊN TIŞTAN Û DIYARBÛNA REWŞÊ**

**Avayiya gund (şênbûna wî, mezinbûna wî, avabûna wî) ji pehnbûna rê diyar e:**
- Tişt, ji nîşanên berê diyar dibin; başbûn û xirabbûna mirovan, yan ya tiştan bi nîşanên berê diyar dibin.

**Berxê çê li ber kozê kifş e:**
- Tiştên baş û nebaş di piçûktiya xwe de diyar in.

**Eger xiyar e ji kûtik ve diyar e/eger xiyar e ji tûtik ve diyar e:**
- Tişta baş, kesê baş ji serî ve diyar e; diyar bû ku wê baş be.
(Kûtik, yan jî tûtik: Xiyarê sere wî nû derketî

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî


## Diyaloga Sûrî-Sûrî; Bingeha Sûriyeke nenavendî û demokratîk e



Endama Ofîsa Têkiliyên MSD'ê li Kantona Cizîrê Derya Remedan diyar kir ku girîngiya demê û qonaxa ku em tê de jiyan dikin bi diyaloga Sûrî-Sûrî heye, tenê bi diyalogê gelên Sûriyê dikarin bighên xalên çareseriyê û dawî li kirîzên mezin bînin.**R-4**

## ‘Mafê Hêviyê hatiye îmzekirin û divê Tirkiyê bixe meryetê’

Endamê Rêveberiya Insiyatîfa Sûrî ya Azadiya Fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzur da zanîn ku pêngavên ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hatine destpêkirin, bi xwe re encamên gelek mezin li ser asta navnetewî ava kirin.**R-5**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1278 1-Pûşper-2025 www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S




## ‘Pêwîst e mafê jiyanê yê jinê were parastin’

Rêvebera Rêxistina Sara ya Têkoşîna li Dijî Tundiya Li Ser Jinan Nisriya Mehmûd û Hevseroka Komînê Gulîstan Fatimê anîn ziman ku divê mafê jiyanê yê jinê were parastin û gotin, “Kuştina jinê kuştina civakê ye."**R-2**



## Elî Hacî Ehmed; Dengbêjî Hest e

Dengbêjê Kurd Elî Hacî Ehmed diyar kir ku dengbêjî hest e, ger mirov çiqasî dengbêjiyê bike ewqasî di hundirê xwe de aram dibe û got, “Dengbêjî ji hundirê mirov derdikeve."**R-7**



DYE’yê xwe li Başûr û Rojava qayimtir dike
Ahmet Aktaş R-4




Parastina çanda resen
Remezan Olçen R-7

# PKK’Ê DÎROK Û SIBEROJ E

Partiya Karkerên Kurdistanê PKK’ê di têkoşîna xwe ya 52 salan de serketinên pir mezin pêk anîn û ava kirin. PKK’ê bi têkoşîna xwe gelê Kurd veguherand gelê herî berxwedêr, azadîxwaz û têkoşer. Wê ji bo tevahî mirovahiyê şoreşa azadiyê pêş xist û cewherê xwe ji têkoşîna azadiya jinê girt. PKK’ê li Kurdistan, Rojhilata Navîn û cîhanê xeyalê ciwanan zindî kir, ruh û enerjiya ciwantiyê di ciwanan de bi rêxistin kir. Herî dawî li ser banga Rêber Apo ya “Aştî û Civaka Demokratîk”, PKK’ê bi guhertin û veguhertineke mezin erkê xwe yê dîrokî pêk anî û pêşî li siyaseta demokratîk vekir.**R-3**



## Jiyana komînal bingeha hebûna civakê ye

Ji bo naskirina dîroka mirovahiyê, pêwîst e mirov li qonaxên wê binêre. Dema ku mirov hewl dide ku pêdiviyên xwe bi cîh bîne da ku jiyana xwe ji nû ve biafirîne, ew di heman demê de xwe û jîngeha xwe jî ji nû ve diafirîne. **R-6**

# Hevjiyana azad felsefeya jiyana azad û demokratîk e

Rêber Abdullah Ocalan “Li ser navê jiyanê gava pêşî ya em di nava civakê de bavêjin, divê derbarê hevjiyana azad de be. Tu qada jiyanê bi qasî qada hevjiyana azad xwedî taybetiya bingehîn û diyarker nîne". Ji lewra em dikarin pirs bikin gelo hevjiyana azad di nava pergala heyî de dikare pêk were?

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Hevjiyan azad çareseriya aloziyên civakî ye. Hevjiyan di zimanê kurdî de tê wateya bi hev re jiyîn, her wiha hemû têkiliyên civakî, çandî, siyasî û hestyarî digire nava xwe. Bi şêwazê girtina biryar, hilbirantin, xebitîn û fikirîn derdikeve holê da ku nijada mirovan li ser rûyê gerdûnê berdewam bike.

Jineolojî zanista jinê ye, ji her jinekê re zanist pêwîste ji bo xwe nasbike di heman demê de derdora xwe nasbike. Jin di her alî de rastî tundiyê tê, ji ber derfeta li pêşiya jinê hatibû girtin bi saya şoreşa Rojava, tevgera azadiyê û fikira Rêber Apo xwe naskir û riya têkoşîna azadiyê da pêşiya xwe. Jin gotinek ne biçûke, gotinek bi têkoşîn, berxwedanî, hêz û zanebûnê tijî ye.

Yek ji têgehên bingehîn ê Jineolojî hevjiyana azad e, hevjiyana azad tê wateya bi hevre jiyîn. Çarçoveya hevjiyanê berfireh e, hemû têkiliyên jin û mêr ên çandî, civakî, hestyarî û siyasî yê di nava civakê de têkiliyên hevjiyanî ye. Her çiqas di navbera jin û mêr de gelek cudahiyên fîzîkî, derûnî û civakî hebin jî ev nabin sedema serdestî û bindestiyê, berovajî vê ev cudahî hevdu temam kirin e. Di serdemeke pir qirêj a dîrokê de, hevjiyana azad û hevtemamkirin; çareseriya mirovahiyê ye.

### Hevjiyana azad çareseirya aloziyên civakê ye

Têkiliyên hevjiyanê xwedî xisletên wisa ne ku ji binî ve, bandorê li ser tevahiya têkiliyên civakî û derdûnî dikin. Heger ev têkilî li ser bingehê wekhevî û azadiyê ava bibin, di her aliyê civakê de, çanda azadîxwaz û wekhevîxwaz diafirîne. Heger ev têkilî li ser bingeha desthilatdarî û koletiyê ava bibin, berovajî vê têkiliyên desthilatdariyê bi xwe re civaka serdest dide ava kirin. Lewma pêwîst e bandorên desthilatî li ser têkiliyên hevjiyana azad nekin. Desthilatdarî li ser her tiştî xwedî bandoreke neyînî ye, di qada hevjiyanê de jî ev taybetî xwe dide der. Serdestiya li ser hevjiyanê bingeha xwe ji damezrandina malbata xanedanî û baviksalarî digire. Ji bo avakirin û parastina vê desthilatê, pergala baviksalarî maf û azadiya jin û zarokan sînordar dike.

Di avakirina neteweya demokratîk de, hevjiyana azad xaleke bingehîn e. Ji ber ku hevjiyana azad, dihêle ku hemû qadên jiyanê, li ser bingehê azadiyê û wekheviyê ava bibin. Ji bo jiyanek wekhev û demokratîk pêwîste ku hevjiyana azad di navbera jin û mêr de pêkwere û têgihiştina wekhevî û azadiyê merceke girîng e.

### Divê bandora kapîtalîzmê li ser hevjiyana azad neke

Ji ber bondora desthilatdarî û kapîtalîzmê jin weke kole di nava civakê de dihat dîtin û tenê bi mal ve dihat sînordarkirin, hişmendiya mêrê desthilat ango zilamê fêlbaz li ser jinê dihat meşandin û jin weke amûrekî dihat dîtin, lê dema em li civaka xwezayî vegerin emê wê demê ked û zanebûna jinê bibînin, di nava klanan de jin pîroz dihat dîtin weke “Jina Dayîk” dihat naskirin lê ji ber zihniyeta mêrîtî, desthilatdar û zayendperestî jin kirin kole, di bin navê şerm û namûsê de li ser jinê qirkirin, bindestî, zordarî û bê mafî hat feriz kirin, lê bi derketina rêxistin, şoreşa Rajava û ya herî girîng fikir û felsefeya Rêber Apo re, ev bê mafî di derheqê jinê de kêm bû, hêdî hêdî jinê xwe û mafên xwe naskir û koletî qebûl nekir.


Niha ew jinên têkoşer cihê xwe li çeperên şer, dibistan, siyaset, huner, û di malbatê de jî digirin dest û bi saya ked û remanê Rêberê mirovahiyê Rêvwe Apo, ked û mafê jinê hat naskirin. Îro bi taybet em jinên kurd mînaka azadî û cesaretê dibînin, em wan pêşengê şoreşê û azadiyê dibînin. Em ji bîr nekin ku eger jin carekê kole bû mêrê desthilatdar deh caran koleye, koletiyê ji dewletê û desthilatdariyê re dike.

### Hevjiyana azad felsefeya jiyana azad û demokratîk e

Jin û mêrên ku di encama têkoşînê de karîne şoreşeke hişmendî û nirxên azadiyê bipêş bixin, dikarin bibin xwedî hevjiyana azad. Şoreşek civakî ancax bi pêkanîna hevjiyana azad di hemû qadên civakê de pêk werin.

Jina azad û mêrê azad ên ku kirdeya hevjiyana azad in di asta azadî û wekheviyê de xwe perwerde kirin, hem bi hev re û hem jî bi civakê re divê radeyeke pevgirtinê ava bikin. Ev jî ne rewşeke wisa hêsan e, ev têkoşîna derûnî ye, têkoşîna rêxistinî ye, têkoşîna polîtîk e, têkoşîna xwe parastinê ye. Şerê herî mezin a dîrokê ye û gelek dijwar e.

Li gor feraseta jiyana azad a



demokratîk têkiliyên evînê yên di nava zayendan de nêzî felsefeya jiyanê ya hevjiyana azad e. Em behsa hevjînitiyê dikin, em behsa jin û mêrtiyê nakin. Di felsefeya hevjiyana azad de jintî û mêrtiya azad heye. Têgeha jina min û mêrê min dibe sedem ku di nava herdu zayendan de şer rû bide û şêweya têkiliya li ser tundiyê derkeve pêş. Jin li gor çanda jintiyê mêr jî li gor çanda mêrtiyê mezin dibin û ev rol wiha tên parvekirin. Divê ev rol li gorî hevjiyana azad were parvekirin, ne li gorî desthilatdarî û kapîtalîzmê. Eger em îro behsa jiyaneke azad û bi wate bikin emê riya hevjiyana azad ji xwe re bikin mînak û li ser esasê wê jiyana azad bimeşin.

### Ji dahûrandinên Rêber Apo derbarê Hevjiyana Azad de

Karekterê mêr ê serweriya civakê, heta roja îro derfet nedaye ku diyardeya jinê weke zanistî bê nirxandin. Zanistên civakî çiqas kêm û dereng li ser mijarên komîn û demokratîk rawestiyane, ew çend jî zêdetir dûrî mijara jinê mane. Mîna ku bûyerên li dora jinê û serhatiyên wê pir pêdiviyên xwezayî be û ev têgihîştin xwe di hemû zanistan de nîşan dide û di helwestên siyasî û exlaqî de wek pêşferaziyeyekê tê qebûlkirin. Ya herî mirov xemgîn dike, jin bi xwe jî hîn bûye vê paradigmayê xwezayî bibîne. Risteyên ku qala jinê dikin, di bêje û gotinên zilam de, ku mohra xwe, çawa ku li tevahiya zanistan daye, li zanistên civakî jî daye, barkirî ne bi nêzîkatiyên propagandatîf ku qet dest nadin rastiyê. Statuya rastîn a jinê bi van bêje û gotinan ve belkî jî çil caran tê nixumandin, heman weke ku dîrokên şaristaniyê tenê çîn, mêtin, zordestî û işkence ye.

Li ser navê jiyanê gava pêşî ya em di nava civakê de bavêjin, divê derbarê hevjiyana azad de be. Tu qada jiyanê bi qasî qada hevjiyana azad xwedî taybetiya bingehîn û diyarker nîne. Aborî û dewlet weke têkiliya bingehîn têne hesibandin û ev fikreke sabit a sosyolojiya modernîteyê ye. Di encamê de aborî û dewlet jî navgînên hevjiyanê ne. Nabe ku hevjiyan bikeve xizmeta aborî, dewlet û olê de, berevajî divê dewlet, ol û aborî bikevin xizmeta hevjiyanê de. Lewma ev rewşa berevajî xwe li tevahiya sosyolojiya modernîteyê gerandiye.

# ‘Pêwîst e mafê jiyanê yê jinê were parastin’

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Rêvebera Rêxistina Sara ya Têkoşîna li Dijî Tundiya Li Ser Jinan Nisriya Mehmûd û Hevseroka Komînê Gulîstan Fatimê anîn ziman ku divê mafê jiyanê yê jinê were parastin û gotin, “Kuştina jinê kuştina civakê ye.”**



Nisriya Mehmûd



gulîdtan fatimê

Kuştina jinan a ku di van demên dawî de zêde bûye, yek ji pirsgirêkên herî girîng ên cîhanê ye. Kuştina jinê weke kuştina bi zanebûn a li hemberî jinê tenê ji ber ku jin e tê pênasekirin. Kuştina jinan ne tenê kuştinek e, di heman demê de pirsgirêkek civakî ye. Derbarê vê mijarê de Rêvebera Rêxistina Sara ya Têkoşîna li Dijî Tundiya Ser Jinan Nisriya Mehmûd û Hevseroka Komînê Gulîstan Fatimê ji Rojnameya me re axivîn.

Rêvebera Rêxistina Sara Nisriya Mehmûd destîşan kir ku Kuştina jinan pirsgirêkek cidî a civakî û derûnî ye û wiha got: “Di dema niha de qetilkirina jinan zêde bûye û bûye pirsgirêkek ku çareserî jê re pêwîste, herwiha ev qetilkirin nîşaneya wê yekê ye ku jin di civakê de weke welatiyên pileya duyemîn tên dîtin û asayîkirina tundiya li ser jinê ye.

Piraniya yên ku jinê qetil dikin dibin navê “namûsê” de wê qetildikin, lê “Kuştinên namûsê” pirsgirêkek cidî ye ku li seranserê cîhanê bandorê li jinan dike. “Kuştina namûsê” kuştina jin an keçekê ye, bi gelemperî ji hêla endamek malbatê ve, ji bo kiryarek ku tê îdiyakirin ku “namûsa malbatê” binpê dike; pêk tê. Van kiryaran bi gelemperî tevgerên wekî têkiliyên derveyî zewacê an îdiyayên ensest di nav xwe de digirin. Pêwîste ku jin jî xwe ji îdiyayan biparêzin û xwe dûrî şaştiyan bibin, xwedî li xwe derkeve û pêwîste di civakê de hişyariya tundiya li ser jinê bê zêdekirin.”

### ‘Li hember qetilkiria jinan bêdeng nemînin’

Hevseroka Komînê Gulîstan Fatimê diyar kir ku mafê jiyanê yê jinan divê were parastin û wiha got: “Divê em li dijî kuştinên jinan dengê xwe bilind bikin û li dijî vê tundiyê bisekinin û jin bi hev re alîkar bin. Em li dijî qetilkirina jinan bêdeng namînin, herwiha ji bo jiyaneke bê tundî, ji bo mafê xwe ji bo ku jinek din ji me kêm nebe em têkoşîna xwe dimeşînin. Em qetilkirina jinan bi tundî şermezar dikin û banga cezakirina kujeran dikin.”



# Elî Hacî Ehmed; Dengbêjî Hest e

Dengbêjê Kurd Elî Hacî Ehmed diyar kir ku dengbêjî hest e, ger mirov çiqasî dengbêjiyê bike ewqasî di hundirê xwe de aram dibe û got, “Dengbêjî ji hundirê mirov derdikeve."

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Elî Hacî Ehmed ku bi navê Ebû Adil tê naskirin di sala 1955’an de li Dêrika Beravê jidayîk bûye. Ew 4 mehî bû malbata wî ji gund bar kirine û berê xwe dane gundê Kasanê û heya niha malbata wî gundî dijî. Lê bavê Adil ji sala 1988’an ve li Dêrikê bicih dibe. Wî dibistana seretayî li gundê Kasanê xwendiyê, navîn û amadeyî jî li bajarê Dêrikê qedandiye.

Di derbarê jiyan û hunera dengbêjiyê de dengbêj Elî Hacî Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

### Kurtejiyana helbestvan

Dengbêj Elî Hacî Ehmed behsa astengiyên xwendina di wê serdemê de kir û wiha got: “Tevî ku tu kes nebû waneyên me ji me re şêrove bike ji ber ku xwendin bi zimanê erebî bû, lê ez herdem serkeftî bûm di xwendina xwe de. Ji sibeha heta nîvro ez li dibistanê bûm û piştî nîvro ez diçûm ber pez. Ji ber feqîriya wê demê mirov neçar bû ku di temeneke biçûk de kar bike. Piştî qedandina xwendinê min du salan mamostetî jî kiriye, lê ji ber ku debara jiyanê nedibû min berê xwe da karê bazirganiyê û heya roja îro jî karê bazirganiyê dikim. Dema min di dibistana navîn de dixwend ez tevlî partiya çep bûm. Sala 1982’an de dema min Partiya Karkerên Kurdistanê naskir û fikir û felsefeya Rêber Apo qebûl kir, heya roja îro em bi vî fikrî zarokên xwe û derdora xwe perwerde dikin.”

### Hunera dengbêjiyê

Hacî Ehmed diyar kir ku çand hebûna mirov e, kesê ku çanda xwe fam neke û çanda xwe nas neke wê winda bibe û wê bikeve di bin ziman û çandên cûda de, lewma mezinên gundan hertim di civatan de stran, çêrok û tiştên berê digotin da ku çanda wan winda nebe û wiha got: “Di gundê min de çîrokbêj, bilûrvan û dengêj hebûn, tevî ku temenê min biçûk bû jî lê ez ji wan fêrî çanda dengbêjiyê û lîstokên kurmancî bûm, her şahiyek li dar diket keç û xortên gund wek kewres li pey van kesan stran digot in. Vê yekê bandor li min kir û eşqa dengbêjî û govendê li cem min ava bû. Di sala 1976’ an de xort û keçan xwe kom dikirin da ku komekî ava bikin, di sala 1977’an de piştî şehadeta Dijwar êdî me koma xwe binavê koma Cûdî ava kir û me ev yek berdewam kir heya salên 2000’an êdî beşên xwe ava kir, ji ber ku mezin û piçûk hemû tevlî vê komê bibûn û herkesî dixwest zarokên wan tevlî şahiyên Newrozê bibin. Êdî di koma çûdî de beşên zarokan, şano, govend û stran hatin avakirin. Di sala 2002’an de bi awayekî fermî koma kevneşopî hat avakirin, ev kom ji 12 endaman pêk dihat, 6 jin û 6 mêr him karê govendê dikirin û him jî karê dengbêjiyê dikirin, ev yek heya roja îro jî berdewame. Ez jî yek ji nav wan kesan bûm û heya niha karê kovend û dengbêjiyê dikim û ez mamosteyê komê me. Di heman de de dema saziya ziman li bajarê Dêrikê vebû min du aste bidest xistin niha him xwendin û him nivîsandinê bi zimanê kurdî dikim. Di çand û huner û Ekadimiya Civaka Demokrat de perwerda çandê didim û heger pêwîstî hebe li saziyan jî perwerdê didim.”

### Celebên dengbêjiyê

Hacî Ehmed di berdewamiya axaftinên xwe de wiha got: “5 celebên sereke yên dengbêjiyê hene, yek Evîndariye; Dema di buharan de xort derdiketin li ber sewalan, cotyar û nêcîrvan ban û keçik jî derdiketin bêriyê dema hev didîtin bi rengekî evîndariyê li hev vedigerandin. Celebê duyem yê şînê ye; Dema xortek yan keçek berketî diçû ser dilovaniya xwedê dayîkan ji êşa hinavên xwe tavêtin ser wan. Celebê sêyem teranîmên dînî; Ev yek ya feqe û melaya ye dema çîrokên evîndarî di navbera keç û xortan de çêdibû feqe tavêt ser feqa û govenda sê gavî jî li ber tê gerandin. Celebê çaran Peyzok jê re tê gotin; Dema di peyîzan de koçer ji zozanan vedgerin û destê evîndaran ji hev dihat qutkirin bi rengekî xemgînî ev tê gotin. Celebê pêncan Serêlîye; Ev celeb sîwana



dengbêjiyê ye, dema yek serêlîyekî bixwaze, mirov dikare peyzokê bêje, heyranokan û evîndariyê jî bêjî. Ev herpênc celebên serkene ji van celeban gelek şax hene.”

Dengbêj Elî Hacî Ehmed axaftina xwe bidawî kir û wiha got: “Gelek çand û rê û resmên kurdan winda bûne ev yek vedgere dema serhildan li dar diketin gel koçber dibû, ev yek dihişt ku çanda wî jê were dizîn. Lewma dema di sala 2002’an de koma kevneşopî hat avakirin destpêkê em li mezinan geriyan da ku hin govend û çîrokên wida bûyîn peyda bikin. Dengbêjî heste, heger mirov çiqasî merqlî be dengbêjiyê bêje wê hewqasî bihna wî fireh bibe ji ber ku dengbêjî ji hundirê mirov derdikeve. Ev çîrok û dengbêjiyên ku tên gotin hemû bûyerên qewimîne. Daxwza min ew ku ciwanên me fêrî çandinê bibin û lê xwedî derkevin ji ber ku ev navend ji bo me hisret bû, lê îro roj bi saya şehîdan me ev yek bidest xistiye pêwîste ew xwedî li vê kedê derkevin.”

# Wêje rih û nasnameya civakê ye!

**Cîger Efrîn**

Heger em bêjin ku; “Şoreşa Kurdistan’ê bi pêşengtiya Rêber APO wekî şoreşa vejînkirin û afirandina wêjeya civakî pêş ket”, wê ne şaş be. Her çiqas aliyê têkoşîna leşkerî derketî pêş jî, lê rastî ew e ku, Ji ber mercên Kurdistanê û tunehesbandina ji binî ve ya Kurdan, Rêber APO di serî de, bi têkoşîna îdeolojîk hewl da ku, toza li ser rastiya Kurdan rake û hebûna Kurdan wekî gel di serî de bi Kurdan pişt re jî bi neyarên wan bide qebûlkirin. Bê guman ev ne karekî hêsan e. Hêj çavên xwe venekirine, hêjî kom tam nehatibû ser hev, bi êrîşên şovenîstan û rêxistinên ku bûbûn dûvik ji MALBATA BERZANÎ re rû bi rû ma. Bi kurtasî xwe di nav şerkî pir dijwar de dît. Destpêkirina şer ne ku şer çêtir dît û hema xwest şer bike. Şer li ser Rêbertî û Tevgera Azadiyê hate ferzkirin.

Li welatên din ên mîna Rûsya ji beriya şoreşê wêjeyeke wan ya niviskî xurt hebû. Mixabin li Kurdistanê romaneke ku kesayeta netewî, welatparêz derxîne holê, dahûrandina civakê dike tune bû. Ji lewra Rêber APO pêşiya pêşîn kesayet dahûrand. Kerekterê/a ku wê şoreşa Kurdistanê bigihîne serkeftinê afirand û rastiyên civakî



ji nû ve derxistin holê. Ji lewra jî bi dehan şoreş di nava şoreşa Kurdistanê de hatin û têne jiyankirin.

Bi taybetî jî şoreşa Jinê, ku dayîka hemû şoreşan e, reng, şêwe û cewherê wêjeya şoreşa Kurdistanê jî diyar dike û wêjeya Kurdistanê heger ne li gorî felsefa Jineolojî be, negengaz e ku ji civakê re bibe bersiv û rista xwe bilîze.

Ji ber ku şoreşên bi bîrdoziya sosyalîzma ku dewletxwaz, bi tenê wekî şoreşên rizgarkirina ji bin hûkmê desthilatdarekî bûn, wêjeya wan jî ji ya heyî ne bûrî û di encamê de gava em li rewşa jinê ya piştî şoreşê binêrin, em dibînin ku di wêjeyê de hema weke xwe ma ye. Ji lewra heger wêjeya Kurdistanê ne li gorî Jineolojiyê be, bi zanist û fesefeya Rêbertiyê ya; “asta azadbûna jinê asata azadbûna civakê diyar dike”, nehatibe strandin, nikare di nava wêjeya cîhanê de ji xwe re cihekî veqetîne. Wê nikaribe ji rewşa heyî xelas bibe.

Bêguman ji demekê ve ye di nava gerîla û xebatkarên şoreşê de hewldaneke mezin ji bo teysandina nirxên derketine holê di roman, helbest, destan, şano, çîrok û mûzîkê de,hene. Lê mixabin ji ber ku bi dehan cih têkoşînê dikin û timî di nava şer de ne, derfeta ku rûnin û demekê ji nivisandinê re veqetînin, nabînin.

Halbûkî berhemên derketine di serî de nirxên gel in, û divê rewşenbîr û nivîskarên Kurd vî karî bikin. Heger îro nirxên şoreşê nebin malê civakê tevahî wê kengê ev yek pêkwere?

Baş tê zanîn ku; “Dema ku te civak ji hunerê qut kir, tê wateya ku te ji nasname û rih jî qut kiriye. Ya li paş dimîne jî koma tilxeya (moloz) ye.” ( Rêber APO). Ji bo ku em careke din nekevin rewşa tilxeyê,(beriya şoreşê, em wekî civaka Kurd di wê rewşê de bûn), divê em destên xwe lez bigirin û rojeke zûtir nirxên şoreşê û berhemên wêjeyî.

Gava em roman, helbest, destan û çîrokên klasîk bînin ber çavên xwe, em ê bibîn in ku, piraniya wan di pêvajoya serûbinbûna civakan de hatine nivisandin û rasterast êş, jan û hêviyên civakê bi siberojê tînin ziman. Her wiha pir kêm nivîskar dewlemend û jiyaneke rihet û ziktêr jiyan e. gelekên wan ji ber tunebûnê, nikarîne nanê xwe peyda bikin, an jî bi zorê debara xwe kirin e. Jixwe wêjevanekî çav berdan pereyan ew dibe her tişt lê nabe wêjevan. Halbûkî derfetên îro şoreş pêşkêş dike qet û qet ne hindik in û pir zêde ne. Bi tenê li benda wêjevanên ji gelê xwe hez dikin û bi rastî jî welatparêz in.

## Parastina çanda resen



**Remezan Olçen**

Hefteya derbasbûyî me li ser endustrîkirina çandê nivîsîbû. Bi ya vê rêbazê pergala serdest a cîhanî xwe timî hilbiberîne. Mînaka vê ya herî ber biçav jî weke tehekûma ‘Hollywoodê’ dikare were dîtin. Hollywood weke fabrîqeyeke endustirîkirina çandê bi her awayî terse jiyana amerîkan li ser cîhanê berbelav dike. Ev cîhaneke sxite ye lê serdest e. Fîlm, reklam, kinc, amûr û alavên tên nîşandan weke objeyên fetîşê li piyasayên cîhanê tên firotin û belavkirin. Heta lixwekirina cil û bergan, jest û mîmîkên aktêr û aktrîsan giş bi hostatiyekê û di encama tecrûbeyên dehan salan dikeve nav jiyana civakê. Jiyan bi vê rêyê ji wate û maneya xwe tê valakirin. Nirx êdî dibin nirxên sixte.

Dêhna xwe bidinê ev sektora ku jê re dibêjin Hollywood di sala 1910’an de dest bi kar dike. Studyoya xwe ya yekem Nestor Studyo di sala 1911’an de vedike. Lê salên 1930-1940’î salên wê yên pesendbûna serdestiya wê ye. Li studyoyên Hollywoodê bi rêya çêkirina filmên fabrîkasyon çandeke serdest tê afirandin.

Ev çanda sixte jî li gorî zewk û arezûyên bikirên xwe kirdozên xwe bi teşe dibe. Yanî huner êdî dibe amûreke ku li bazarê tê firotan. Nirxa xwe dibe pulên ku li bazarê jê re tê terxandkirin.

Bi vê rêyê çand bi formuleke ku hilberîn û endustrî tê çêkirin. Qalibên standart tên bikar anîn. Çand jî êdî li gorî vê rêbazê weke otomobîl yan jî firaxeke dîtir dibe mal û amûreke ku ne yek û mustesana lê bi hezaran kopî. Ev jî teşaşevanên xwe vediguherîne, wan dike bikirên pasîf. Hemû hilberîn cuda tên nîşandan lê di bingeha wan de formula wan yel e. Ev jî bi xwe re xweseriya ramanê, afirandinê heta ferdûnê jî ji hole radike. Civak bi ferdên aktîf, xwedî raman dibe civakeke afrîner lê bi rêbaza endustrîkirina çandê ferd jî dibin weke amûreke fabîkasyonê. Amûrên çanda esdustrîkirî bi bihaneya kêfxweşkirina mirovan dike ku mirov taetê ji pergala serdest re bikin. Ji ber ku mirov êdî nafikirin û tenê dikrin û difroşin.

Îcar ev rêbaza endustrîkirina çandê herçend di nava demê de şêweyên xwe guhertibin jî di bingeha xwe de armanc wek xwe maye. Ango çêkirina civakeke pasîf û îtaetkar hedefa xwe ye. Di serdemeke ku aqlê çêkirî jî di xizmeta vê pergalê de ye, derketina ji vê dehfik û kemînê encax bi dilsoziya bi nirxan re çêbibe. Her çi civaka Kurd e, di encama têkoşna xwe ya bi dehê salan de nirxên welê afirandine ku her nirxekê bi bergîdana cîhanekê de ye. Ji ber wê di ware parastin û pêşvebirina çanda resen de jî erk û berpirsyariyeke mezin li ser milê civaka Kurd e.

# Jiyana komînal bingeha hebûna civakê ye

**Têkoşîn Amara/Qamişlo**

Di dîroka mirovahiyî de pêwîst e ku mirov li qonaxên dîroka mirovahiyê binêre. Dema ku mirov hewl dide ku pêdiviyên xwe bi cîh bîne da ku jiyana xwe ji nû ve biafirîne, ew di heman demê de xwe û jîngeha xwe jî ji nû ve dafirîne. Ji ber vê yekê, divê destpêka dîrokê wekî civakbûna mirovan were hesibandin. Ji niha û pê ve, mirovên civakî wê bi hilbijartina xwe heta radeyek zêdetir dest bi hilberînê bikin. Tê zanîn ku di serdemên ku têkiliyên xweza-mirov bi giranî dihatin diyarkirin de, mirov li daristanên germ û nerm (jêrîn) dijiyan, hilberîna masiyan dihat kirin û tîr û kevan dihatin dîtin (jorîn), merhele dihatin jiyîn. Di serdemên dîrokî de ku têkiliyên civakî tê de hatine destnîşankirin, piştî civaka komunal a destpêkê civaka kole, civaka feodal û civaka kapîtalîst hatine.


### Civaka bê parastin ne civaka komînal e

jiyana komînal bingeha hebûn û nasnameya civakiyê, civak ancax bi hebûna komînal bikare bijî. pêşketinên azad yên jiyana civakî li dora nirxên komînal bi pêşketinên rêxistinî ve girêdayî ye. rêxistinbûyîn jî tê wateya anîna hêza parçebûyî ya civakê bi destxistina nirx, raman û îradeyên hevpar. Komînên ku ferd xwe tê de birêxistin dike, xwe naskiriye garantiya serkeftinê ye ji bo avakirina Netewa demokratîk. Rola rêxistinên komînal berxwedana gel a li dijî qirkirinê rojane di gelek ezmûnan de tê dîtin, ji bo civakek komînal jiyan bike û bi rihekî hevpar xebat bide meşandin û li hemberê desthilatdaran têbikoşe di nav civakê de komînê taxan esas tê girtin. “Aşitî bê Şer nabe” ew gotin ji bo roja me ya îro derbasdare, şer tenê bi çek û li eniyên şer tenê nayê kirin. Pêwîste civak karibe xwe biparêze civakek bê parastin ne civakek komînale ji ber ku desthilatdar hewildidin civaka rêxistinkirî tune bikin.

Rihê hevkariyê’ yek ji pênaseyên herî baş e ku şêwaza jiyan û hebûna herî kevn a mirovahiyê ye. Lê belê rastiya îstîsmarê ya ku mirovahî pê re rû bi rû maye, biyanîbûn û dûrketina ji jiyana komîn pêk tê. Kesên ku ji jiyana komînal dûr ketine, ango civakbûna wan ji hev belav bûye, rastê zext û îstîsmarê tên. Hêza herî mezin a parastinê ya ku civakê diparêze civakbûn bi xwe ye. Ti hêz nikare demeke dirêj li ser civakeke ku civakbûna wê neyê çewisandin û paşveçûn serdest bibe. Ji ber vê yekê yekem tişta ku serdest êrîş dikin civakbûn bi xwe ye. Dîsa di rastiya ku karekterê dide civakbûnê de jin û mêr hevdu temam dikin, ji hev re ne xerîb in, şêwazek têkiliya serdest nayê naskirin.

### Rêxistinbûyîn hêza civakê ye

Gelê ku bi paradîgma civaka Demokratîk, ekolojik û azadiya zayendî, hişmendiya xwe ya netewî, ruhê xwe yê netewî gihandiye jor, bi veguherandina vê hişmendiyê û ruhê bi saziyeke netewî re rû bi rûye. Qabîliyeta jiyana civakî ya ku li dora nirxên komînal ku bi azadî pêş dikeve bi rêxistinbûyîne ve girêdayî ye. Rêxistinbûyîn tê wateya hêza komkirina civakê û bi destxistina ruh, fikir û îradeya li dora nirxên hevpar. komînên ku li ser wî bingehê hatine rêxistinkirin û naskirin, hem ji bo avakirina netewa demokratîk a kurd hem jî ji bo berxwedana li dijî qirkirinê teminata serkeftinê ye. Ji nû ve birêxistinkirina jiyana komînal nayê wateya îcadkirina civakeke nû. Ew e ku cewherê civakê yê paşverû, biyanîbûyî û bindest derxe holê û li xisletên wê yên exlaqî û polîtîk, ango li vîna xwe vegerîne. Eger şeklê rêxistinbûnê li ser bingeha komun û meclîsan were pêşxistin, ancax wê demê bi sepandina demokrasiya rasterast îradeya civakê dikare derkeve holê.





Di dema ku komun yekeyên jiyana aborî, ekolojîk û exlaqî yên civakê ne, meclîs bi awayekî demokratîk nasname û vîna xwe nîşan didin; Ew yekîneyên siyasî yên exlaqî ne ku têkiliyên hundir û derve bi rê ve dibin.

### Rêber Apo;Civaka jor dikare demokrasiyê pêk bîne

Rêber Apo di parêznameya xwe de vê rewşê wiha tîne ziman: “Wekî ku gelek caran tê gotin, dewlet rêxistineke pir kevn û bingehîn a civaka jor e, ne bi awayekî demokratîk ava bûye, kevneşopî ye û bi tayînkirina qeyûman tê birêvebirin. Civaka jor dikare di nava xwe de demokrasiyê pêk bîne. Di modela komara rojavayî de, ewil dewlet tê, paşê demokrasî bê dewlet nikare bifikire. Di dîrokê de Kurd ji dewletbûnê zêdetir meyla avakirina demokrasiyê bûne. Bingehên dîrokî yên lêgerînên demokratîk ên îroyîn pir xurt in. Di serdema eşîran de ku hê jî nirxên jiyana komînal serdest bûn, pêkanînên yekîtiya konfederal ên di demokrasiyên gelan de li Kurdistanê bi awayekî berfireh hatin dîtin. Taybetmendiyên cewherî yên demokratîk ên eşîran derbasbûna konfederalîzma eşîran gelek hêsantir kir.

Ji ber ku jiyana eşîrî li ser mêrg û zeviyên xwezayî ye, parastina van herêman xwedî girîngiyeke jiyanî ye. Her çiqas sînorên eşîran wek sînorên dewletê girtî nebin jî, jiyanî ne. Binpêkirina sînorên eşîran tê wateya ku jiyana hemû civakê di xeteriyê de ye. Ji ber vê yekê, nakokiyên di navbera eşîran de ji bo tevahiya civakê dê bibe kujer. Ji ber vê yekê pêwîste ber bi komînalkirina qadên jiyanê û demokratîkkirina sînoran li gorî pêwîstiyan bi hev re bên parvekirin, da ku berjewendiyên hemû civakan bên parastin. Ji bo vê jî pêwîstiya eşîran bi meclîseke hevpar heye ku tê de bicivin û pirsgirêkên xwe çareser bikin. Li aliyê din metirsiya êrîşên hêzên şaristaniyê zêdetir e; ji bo pêşî li nakokiyên navxweyî bigirin û li hemberî êrîşên derve bisekinin sendîka ava kirin. Avakirina vê yekîtiyê xwedî taybetmendiyên demokratîk bû û bi awayekî konfederal pêk hat”.

### Komînalbûyîn jiyana civakî esas digre

Têgîna komînalbûyînê raste rast jiyana civakî esas digre. çawa ku komînalbûyîn bingeha hebûna civakê ye, komîn jî bingeha rêxistinkirina pêwîst a parastina civakbûna xwe ye. Komîn, têgîneke ku bi mirovahî û civakbûnê hatiye naskirine. Di dîroka mirovatiyê de, piştî qonaxeke diyarkirî ya jiyana eşîra koçeriyê, sê qonaxên bingehîn ên pêşketina komîn û civakbûnê li ser bingeha cihêbûna eşîrî dikare were gotin. Ev civakên li ser berxwedana parastina nirxên hemwelatîbûnê yên ku ji aliyê bawerî, ziman û bi giranî etnîkî ve hatine avakirin in. Li Rojhilata Navîn civakên Semîtîk û Aryen li dora bawerî û zimanekî hevpar pêşketineke mezin nîşan didin. Etnîsîte di encama civakbûna qebîleyê ya ku ber bi nîveke Serdema Neolîtîk ve derketiye holê, weke pêkhateyekê pêşketiye û hişmendiya welat gav bi gav bi çandina axê, veşartina miriyan di nava axê de û qebûlkirina vê axê weke parçeyekî welatê xwe bûye çavkaniya bingehîn a civakîbûnê. Ligel qatbûna civakê, civakên komîn ên li derdora berxwedana etnîkî (parastina welat û nasnameyê) û olî ji dîrokê heta niha di warê parastina hebûna xwe de bi berxwedanên ku kirine nav û dengek layîq bi dest xistine. Civakên ku li hemberî êrîşên hêzên şaristaniyê dem bi dem neçar man koç bikin, dema derfet dîtin li ber xwe dan. Ev berxwedan li Îran, Afganîstan, Kafkasya û Kurdistanê kom bûne.

### Taybetmendiyên civaka komînal yên sereke

1. Modela civaka bê dewlet: Li şûna desthilatdariya navendî, rêveberiya herêmî esas tê girtin. Li dijî sazûmana zordar a dewletê modelek li ser esasê beşdariya rasterast a gel tê parastin.
2. Xweseriya Demokratîk: Her civakek xwe birêve dibe. Bi rêya meclîs, komun û koperatîfan biryar tên girtin.
3. Nêzîkatiya ekolojîk û azadiya jinê: Li dijî pêkhatina pergala kapîtalîst a ku hawirdor û jinê diperçiqîne, civakek hawirdorparêz û wekheviya zayendî tê armanc kirin.
4. Hilberîn û jiyana kolektîf: Ji ferdperestiyê bêtir jiyana hevpar a li ser bingehê hevgirtinê tê giran kirin.
5. bi şoreşa 19’ê Tîrmehê re gelê bakûr û rojhilatê sûriyê bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo bi avabûna konfederalîzma demokratîk û xwe rêvebirinê esas digre.



# Foza Yûsif: Derketina PKK’ê Ronesans e

Endama Konseya Hevserokatiya PYD'ê Foza Yûsif Diyar kir ku damezirandina Partiya Karkerên Kurdistanê bandoreke mezin li her çar paçeyên Kurdistanê û cîhanê kir û got, “Derketina PKK'ê ji bo kurdan ronesans e."

**Amara Baran/Qamişlo**

Endama Konseya Hevserokatiya Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) Foza Yûsif derbarê girîngî û rola PKK’ê di Kurdistan û cîhanê de ji rojnameya me re axivî.

### ‘PKK siyaseta îmha û înkarkirina li ser kurdan perçe kir’

Foza Yûsif diyar kir ku damezrandina PKK’ê hişt ku Kurd di Rojhilata Navîn de bibin xwedî hêzekê sereke û wiha got: “Damezrînerê Partiya Karkerên Kurdistanê Rêber Apo xwe nespart taybetmendiya malbatî û eşîrtiyê, ew Rêberekî gelerî bû. PKK’ê roleke girîng da jin û hertim xwedî bernameyên bi hêz û nêrînê dagirtî bû. Damezrindina wê ji bo kurdan bû ronesans û zanisteke netewî ava kir, bandora siyaseta înkarkirinê ya li ser Kurdan dihat meşandin, di radeyek mezin de ji holê rakir, carekdin hişt ku canda Kurdî xwe ji nû ve zîndî bike û Kurd bi hebûna xwe bihisin. PKK îmha û înkarkirina li ser gelê Kurd parçe kir.”

### ‘PKK tekoşîneke bê hempa da û dide meşandin’

Foza Yûsif axaftina xwe wiha domand: “Dîroka PKK’ê ispat kir ku berdel çiqas mezinbin jî ew ji bo azadiyê û serfiraziyê tu car gav bi paş ve navêje. PKK’ê ji bo ku armanca xwe pêk bîne tekoşîneke bê hempa da û dide meşandin, di wê oxirê de berxwedaniyek mezin li zindanan û li çiya hat dayîn. Rêber Apo her şahadetek vegerand hemleya azadiyê, ji şahadeta Hakî Karer û heta roja îro şahadetedên ku çêdibûn, bû sedem ku girêdana bi nirxan û biryara tekoşînê bi israr bilind bibe û mezin bibe. PKK’ê ne tenê teorî, pratik kir, Lewma gelê Kurd îro bi hebûna xwe deyndarê şehîdan e. “

### ‘Ji bo Kurdistaneke azad pêwîstî bi PKK’ê hebû’

Foza Yûsif got ku tekoşîna ku bi salan hatiye meşandin zexteke pir mezin li ser dewleta Tirk kir û wiha anî ziman: “Dewleta Tirk înkar dikir ku Kurdistan metîngere, Rêber Apo cara yekem di sala 1970’ de dibeje ku “Kurdistan metîngere “ ji bo ku ji metîngeriyê rizgar bibe pêwîst e ku partî bê avakirin û tekoşîn bê meşandin. Berya PKK’ê bê avakirin gelê Kurd wekê tirkên çiya dihatin pênasekirin û siyasetek tûnd yên înkarê li ser Bakurê Kurdistanê dihat meşandin. Bi derketina PKK’ê re pirs di serê civaka tirk û Rojhilata Navîn de çêbû gotin gelekî heye û navê wî kurde û xwedan dîroke û mafê wî ji deste wî hatiye girtin. Dewleta Tirk herçiqas bi polîtikayên înkarê xwest berxwedaniyê bişkîne û hertim înkarkir ku dozekî kurt heye lê berxwedaniya ku hat kirin siyaseta înkarê vala derxist.”

### PKK’ê bû nasnameya gelekî

Foza Yûsif bal kişand ser israr û berxwedaniya PKK’ê ya ku di cîhanê de mînaka wê nîne û wiha anî ziman: “Dewleta Tirk ya ku hertim hebûna gelê kurd û tevgera azadiyê tune dihesiband di sala 1993’an de îtîrafkir ku PKK’e tevgereke xorte. Dewleta tirk ji bo ku tevgera azadiya Kurdistanê tune bike di dehsalên dawiyê de gelek rê û rêbazan xistin dewrê, taybet di warê leşkerî de çi sîleh û teknîka wî ya pêşketî hebû kar anî heman demê de çekên qedexekirî yên di destê xwe de li ser qadên gerîla kar anîn lê nekarîn ku berxwedaniya gerîla bişkînin. Dewleta tirk dît ku PKK ne tenê partiyeki ye êdî bûye nasnama gelekî lewma jî naçarma êdî rastiya ku holê ye qebûl bike. Însiyatîfa ku niha destpêkiriye bi banga Dewlet Bahçelî û bersivdayîna Rêber Apo ji aliyê dewleta tirk ve îtîrafekî nû bû ku nikaribûn tevgera azadiyê û nasnama gel tune bike. Li Tirkiyê û Rojhilata navîn de kurd bûne hezekî mezin bê kurdan nikare siyaset bike, gotina bahçelî a ku dibêje Tirk bê Kurd nabin rastiya kurd a dîrokî dide îfadekirin, bê kurd nikarin pêşeroja Rojhilata Navîn bi serê xwe îfade bikin.”



### ‘Tevahiya cîhanê li Rêber Apo xwedî derket’

Foza Yûsif wiha domand: “Dewleta Tirk îro neçar maye ku Rêber Apo mûxatap bigre. Polîtîkayê parçekirinê li ser gelê kurd meşandin têrê nekir hewildan ji bo tevgera azadiyê tune bikin nekarîn wî jî bikin, Hewildan bi tecrîdek giran Rêber Apo bê bandor bikin lê hêzawan tera wî jî nekir gelê kurd û tevahiya cîhanê xwedî li Rêber Apo derketin ku îro mûxatap tê girtin.

### ‘Dewleta Tirk bi rêya çapemeniyê xwe şerê pîsoklojîk dimeşîne’

Foza Diyarkir dewleta Tirk di vî pêvajoyê de şerê çekdarî daye seknandin lê şerê pîsoklojîk kiriye dewrê û wiha got: “Dewleta Tirk Îro gotinên ku di medya xwe ya dîjîtal û di televîzyonan de dikin, hemû jî ji bo ku xwe di raya giştî de bidin nîşandan ku ew pir bihêzin. Ji bo ku di hilbijartinan de dengê xwe biparêzin, milekî din de jî li hemberî gelê Kurd şerê taybet û şerê pîsoklojîk didin meşandin. Pêwîste gelê me li hemberî van polîtikayên şerê taybet hişyar bin û çapemeniya xwe esas bigrin û perspektîfê Rêber Apo û nirxandinê tevgera azadiyê esas bigrin.”

### ‘Serkeftina pêvajoyê azadiya fîzîkî a Rêber Apo ye’

Foza Yûsif axaftina xcwe wiha qedand: “Îro yên ku pêvajoy dimeşîne û bi rêva dibe Rêber Apo ye, ji bo serkeftina pêvajoyê derfetên kar girîn ge. Her çiqas çûndin hatin hebin jî ne yasayî ye ne di asta ku Rêber Apo bi awayek azad bikaribe kare xwe bide meşandin. daxwaza ku divê Rêber Apo bi awayek fîzîkî kare xwe bike daxwazekî girîng û jiyanî ye, heta ku mafê hêviyê neye dayîn Rêbertî nekare asta ku tê xwestin de xebat bide meşandin. Pêwîste dewleta Tirk guhertinên yasayî çêbike . Gelê me hemleya ku daye destpêkirin ranewestîne û xebatên zextkirinê li ser dewleta tirk bidomîne hem ji bo ku yasa derxîne heman demê de rewşa niha ya Rêber Apo biguherîne.”

# Xerîb Hiso: Konferansa li Yonanistanê bi encamên serkeftî bi dawî bû

**Vîndar Roj/Qamişlo**

**Di 24’ê Gulanê de Konferansek ji aliyê Navenda Lêkolînê ya Îslamî a Rojhilata Navîn û Behra Sipî li Yonanê bi beşdariya Partiya Yekîtiya Demokrat PYD hat orgenîzekirin. Konferans bi dirûşmeya “Pirsgirêka Kurd û geşedanên li Rojhilata Navîn” lidar ket.**

Navenda Lêkolînên Rojhilata Navîn û Îslamî li paytexta Yûnanistanê Asînayê, li baregeha Enstîtûya Têkiliyên Navnetewî ya li paytextê, konferansek bi navê “Pirsgirêka Kurd û Geşedanên li Rojhilata Navîn” li dar xist. Şandeyek ji partiya PYD’ê ku ji Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk Xerîb Hiso û hevseroka Ofîsa Têkiliyên Giştî ya partiyê Sema Begdaş beşdarî konferansê bûn. Têkildarî vê Koonferansê Hevserokê Partiyê Xerîb Hiso ji rojnameya me re axivî.

Xerîb Hiso di destpêka axaftina xwe de ev anî ziman: “Ev demeke em li ser orgenîzekirina vê Koonferansê dixebitin. Komîteya me li Yonanê li ser vê yekê kar dikr û li kêlek wan jî dostên me yên Kurd û Yûnanî jî



bûn alîkar. Di konferansê de ji gelek welatên Ewropayê û kesayetên naskirî beşdar bûn. Tevahiyên ku tevlî vê konferansê bûbûn naskirineke wan li ser doz û pirsgirêka gelê Kurd hebû, bi wê jî dema ev konferans amede bûye gelek kesan dixwastin beşdar bibin. Ji welatên ku beşdar bûne jî Poloniya, Almaniya, Emerîka, Nemsa û ji Yonanê ku kesayetên akedemisyen û professor di asta zanîngehan de amede bûn. Bi giştî nêzî 100 kesî beşdar bûn.”

### Konferans di çarçoveya pêvajoya “Aştî û Civaka Demokratîk” de lidar ket

Xerîb Hiso di dirêjahiya axaftina xwe de armancên konferansê bi lêvkirin û got: “Armanca vê konferansê yek naskirina pirsgirêka Kurd û çareseriya wê, aloziya ku niha di rojhilata navîn de heye yek ji sedemên wê neçareserkirina pirsgirêka Kurd e. Ger pirsgirêka Kurd neyê çareserkirin wê aloziyên heyî dewam bikin. Di nêrînên beşdarvanan de jî ev yek derdiket pêş.

Ya balkêş ku ev konferans di çarçoveya pêvajoya nû a ku Rêber Apo destpêkiriye “Banga Aştî û Civaka Demokartîk” de hat birêxistinkirin. Pê ve girêdayî her kesê ku di vê konferansê de beşdar bûbû destekdayîn û behsa Aştî û çareseriyê kirin ku ev pêvajo wê merheleya heyî ber bi çareseriyê ve bibe. Her wiha ji vê konferansê wê pirtûkek bê amedekirin û li zanîngehan bê belavkirin. Armanc wê çi be; kî bixwaze pirsgirêk û doza gelê Kurd nas bike, her wiha rêbazê çareseriya demokratîk û sîstema ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye avakirin bizanibe, dikare li wê pirtûkê vegere. Ji ber êdî doza gelê Kurd li çar perçeyên Kurdistanê û cîhanê tê guftigokirin û pirsîn. Ji vê zêdetir di konferansê de her çiqas rewşa Rojavayê Kurdistanê hat nîqaşkirin, ewqas Bakurê Kurdistanê kete nîqaşê de. Ji ber pêvajoya Aştiyê a li wê derê destpê bûye wê di serdema nû de gavên mezin bêne avêtin.”

### Paradîgmeya Rêber Apo dibe cîhanî

Xerîb da zanîn ku paradîgmeya Rêbertî cîhanî dibe û wiha pê de çû: “Di konferansê de ji aliyê beşdarvanan ve gelek soz û piştgirî hatin raberkirin ku her kesê ji welatekî hatiye, di welatê xwe de jî dikare bi kesayetên navdar, professor û akedemisyanan re van rastiyan parve bikin. Em jî vê yekê erênî dibînin ku her kes cavê xwe li sîstem û peradîgmeya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye avakirine. Helbet ev yek jî bi saya paradigma û keda Rêber Apo pêk tê ku îro felsefeya Rêbertî dibe cîhanî. Ji lewra wê di vê çarçoveyê de gelek gavên girîng bên avêtin”.

### Hevdîtinên bi partiyan re hatin kirin

Herwiha Xerîb Hiso destnîşan kir ku wan bi hin partiyên Yonanî re hevdîtin kirine û wiha got: “Bi çûyîna me ya Yonanê re me xwest em bi hin partiyan re hevdîtinan bikin ew jî Partiya Hevgirtina Hêzên Çepgir (Sêrêza) û Partiya Sosyalîst a Yonanî Tevgera Guhartinê (Basok) ku her du partî jî ji partiyên herî kevnar di Yonanistanê de ne û di perlamana Yonanê de cih digrin ev hevdîtin jî di cihê perlamanê de pêk hat. Hevdîtin pir baş derbas bû nêrîna wan jî baş û erênî bûn. Li gorî rewşa siyasî a heyî nêrînên me hevbeş bûn. Her wiha wê ev ziyaret û danûstandin bi her du partiyan re berdewam bin. Di heman demê de soz ji bo dema pêş jî hatin dayîn ku partiyên li ser Deryaya Sipî di demên pêş de werin gel hev, me jî piştgirya vê yekê kir û vexwandina wan ji bi sardana Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate kirin. Her wiha me civînek bi gelê me yên ku li Asînayê dimînin re lidar xist.”

Hêjayî gotinê ye ku konferans ji saet 10’ê Sibê heyanî 7:30’ê Êvarê berdewam kir û li ser çar beşan hat orgenîzekirin, di her rûnişkandinekê de însanên akedemisyen û kesên di asta wezaratan de mane beşdarî panelan bûn. Axaftina destpêkê bi navê Partiya PYD’ê Xerîb Hiso ve hate kirin her wiha axaftina dawiyê jî ji aliyê Ofîsa Têkiriyan a PYD’ê Sema Begdaş ve hate kirin û encamnameya kobferansê nîn bû.

# Diyaloga Sûrî-Sûrî; Bingeha Sûriyeke nenavendî û demokratîk e

Endama Ofîsa Têkiliyên MSD'ê li Kantona Cizîrê Derya Remedan diyar kir ku girîngiya demê û qonaxa ku em tê de jiyan dikin bi diyaloga Sûrî-Sûrî heye, tenê bi diyalogê gelên Sûriyê dikarin bighên xalên çareseriyê û dawî li kirîzên mezin bînin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Di 8'ê Kanona 2024'an de bi hilweşîna rejîma Baasê û bi hatina HTŞ'ê li ser desthilata Şamê guhertinên cewherî di giştî Sûriyê de û li hemû astan pêk hat. Pê re jî yekirina aliyên Kurdî bû mercê bidesxistina mafê gelê kurd di Sûriya nû de. Di encamê de Konferansa yekhlewesta Kurdî li Rojava hat lidarxistin û helwesta aliyên kurdî heya astekê bû yek. Herwiha yek ji mercên avakirina Sûriyeke nû, demokratîk û pirengî, pêşxistina danûstend û diyaloga Sûrî-Sûrî ye ku bêyî destwerdana aliyên derve ya ku her tim ji bo berjewendiyên xwe kar dikin. Di heman demê de yekrêziya Kurdî bû bingeha diyaloga Sûrî-Sûrî. Li ser vê bingehê jî, ji aliyê Rêveberiya Xweser û Meclisa Sûriya Demokrat MSD'ê gelek konferans, civîn û çalakiyên cûr bi cûr di vê çarçoveyê de hatin lidarxistin.



Derbarê diyaloga Sûrî- Sûrî, endama Ofîsa Têkiliyên Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê li Kantona Cizîrê Derya Remedan ji Rojnameya me re axivî.

Derya Remedan diyar kir ku Sûriyê piştî hilweşîna rejîma Baas di pêvajoyeke demikî re derbas dibe û wiha got: "Îro roj weke em dibînin Sûriyê di dem, hikûmet û destûrekî demikî re derbas dibe. Lewma her kes meraq dike wê Sûrî di pêşerojê de ber bi ku ve here. Ji bo vê yekê gelek xal tên nîqaşkirin mîna; 8 xelên girîng ên ku di hevpeyaman di navbera Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokraîtk (QSD) Mezlûm Ebdî û Rêveberê desthilata Şamê Ehmed El-Şeri hatine imzekirin û wê ev xal li ser erdê çawa pêk bên. Girîngiya demê û qonaxa ku em tê de jiyan dikin, girîngiya wê bi diyaloga Sûrî-Sûrî heye. Herwiha diyalog ew e ku ne tenê Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rêveberiya Xweser, lê bi hemû pêkhateyên Sûriyê diyalog were kirin."

**'Sûriya nû ne mafewer be wê kirîz mezintir bibe'**

Derya Remedan destnîşan kir ku daxwazkirina maf di destûrê Sûriya nû de erkê hemû pêkhateyên Sûriyê ye û wiha got: "Ji mafê hemû netewên ku li Sûriyê jiyan dikin cihê xwe di destûrê Sûriyê de bigirin û mîna berê neyên paşguhkirin û rola wan were windakirin. Ji ber her pêkhateyekî ku li ser axa Sûriyê ye, xwediyê heman mafî ye ku bi nasnameya xwe ya çandî were qebokirin. Di heman demê de di destûrê Sûriyê de bên tesbîtkirin. Her çiqasî rejîma Baas bi tundî di derheqên hemû pêkhateyên di Sûriyê de siyaseta xwe pêk tanî, lê niha ev rewş hatiye guhertin û avakirina Sûriyeke nû ku mafewer û demokrat be girîng e. Heger di Sûriya nû de ev yek pêk neyê wê kirîza Sûriyê hîn kurtir û mezintir bibe."

**'Bi diyaloga li ser maseyekê em ê bighên xalên çareseriya kirîza Sûriyê'**

Derya Remedan êşkere kir ku beriya niha gelek hewldanên diyalogê ji aliyê Rêveberiya Xweser û MSD'ê ve hatine kirin û wiha got: "Beriya niha rêya diyalogê ji aliyê rejîma Baas a hilweşyayî ve dihate astengkirin. Tevî ku Rêveberiya Xweser û Meclisa Sûriya Demokratîk jî gelek hewldan kirin, kongr û konferans jî lidar xistin û herdem tekezî li ser diyalogê dikirin ku gelên Sûriyê werin bi hev re li ser masekê rûnên, bi hev re qeder û mafên xwe nîqaş bikin û bighên xalekî çareseriya kirîza Sûriyê, lê ev yek ji aliyê rêjîma Baas ve dihate astengkirin. Her kes jî dizane ku deriyê diyalogê ji aliyê gelê Kurd ve her dem vekiriye û ji bo çareseriyeke bi rêya demokratîbûna Sûriyê her dem hewildan têne kirin. Helkeftinên hevpeymana yekemîn di dîrokê de jî tê nîvisandin ku beşekî Sûriyê Kurd bêtirî xwe temsîl dikin, ev jî gavekî dîrokî ye, deriyeke vebûye ev derî jî li vê helkeftinê de derket, ew jî helkeftina Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demoratîk QSD Mezlûm Ebdî û Rêveberê desthilata Şamê Ehmed El-Şeri û 8 xalên wê yên girêdayî qeder û mafên gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Sûriyê giştî tê de diyar û misoger dibe. Di heman demê de hevpeyaman Helebê ya Şêxmeqsûd û Eşrefiyê jî derbarê parastina wan her dû taxan de gavekî girîng bû."

**'Diyalog rêya Sûriyeke demokratîk û nenavendî misoger dike'**

Derya Remedan di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku xuyaye Sûriyê bi guhertineke siyasî ve diçe û wiha got: "Rêkeftin û nîqaşên ku niha bi desthilata Şamê re têne kirin tê wateya ku em ber guhertineke siyasî ve diçin, di heman demê de jî diyar dibe ku em dikarin li ser maseyekê bi hev re rûnên û tiştên heyî giftûgo bikin. Herwiha bi rêya danûstendin û diyalogê tekez em ê bighên encmanan. Hêviyên me jî hene ku di pêşerojê de wê diyalogên baş bên kirin ku ew jî diyalogên derbarê mafên hemû pêkhateyên li Sûriyê jiyan dikin. Diyalog rêya Sûriyeke demokratîk û nenavendî misoger dike."



## DYE'yê xwe li Başûr û Rojava qayimtir dike

**Ahmet Aktaş**

Li gorî gotin û trafika diplomasiyê, tê xuyakirin ku Emerîka, him li Bexdayê û him li Şamê giraniya xwe mezintir dike.
Li dijî rêveberiya Bexdayê, senatorên Emrîkî nameyek tund şandine Wezerata Derve ya DYEyê, nerazîbûna xwe bi tundî nîşan dane û gotine; "Bexda, bi tevayî ketiye ber destê Îranê"!
Li Moskovayê, Şêwirmendê Ewlekariya Netewiyê Iraqê Qasim Ereci û Sekreterê Ewlekariya Giştî ya Îranê Elî Ekberî dicivin.
Li rex vê hilwesta dijberî Bexdayê, li gel rêveberiya Hewlêrê gotin û peywendiyên xwe xurtir û mayindetir dike.
Hevpeymanên bazirganiya enerjî û xazê, ji dijî yasayên Bexdayê, yekser li gel Rêveberiya Federal a Herêma Kurdistanê çê dike.
Her wiha him Bafil Telebanî û him Mesrûr Berzanî vedixwînin Washingtonê.
Hema hema hilwestek wisa dijîbe ya Bexdayê, li Şamê jî birêve diçe.
Li vira jî, Îsrail ji rexekî ve rêveberiya demkî ya Ehmed Şara tengav dike û hewcedarî hewara DYE'yê dike, li aliyê din li ser vê senaryoyê Trump li Riyadê, nûnerê wî yê berpirsê Sûrî Thomas Barrack li Stenbolê, hevdîtinê bi Ehmed Şara re çêdikin.
Hema li pey van hevdîtinan Thomas Barrack ê ku di heman demê de Serbolyozê DYEyê li Enqereyê ye, vê Pêncşemê derbasê Şamê dibe û "xwoşewistiya" xwe ya li gel Rêveberiya Şamê bi pêşve dixe û bi Wezîrê Derve yê Sûriyê Şeybanî re, xaniyê xwe yê Balyozxaneya Şamê, piştî 14salan vedikin.
Di heman rojan de şandeya Rêveberiya Xweser a Rojava jî li Şamê ye û wê di çarçova peymana navbera Mezlûm Ebdê û Ehmed Şara de hevdîtinan pêk bîne.
Her wiha tê gotin, cezayên berê yên li ser Sûriyeyê hatin rakirin.
Li aliyê din, têkilî û peywendiyên xwe yên li gel Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Suriyeyê(Rojava), her xurtir dike.
Bi vêya jî ranaweste, ji bo yekrêziya Kurdên Başûr û Rojava hewldanên şênber dike, li ber çavê raya giştî.
Her wiha piştgriya têkilî û peywendiyên navbera Mezlûm Ebdê û Mesûd Berzanî dike.
Di heman demê de destekê dide, peywendî û pêkhatina hevpeymana navbera Mezlûm Ebdê û Ehmed Şara jî.
Heta li goreyî TVa El Meşhed a Dubai dibêje; "Enqere xwe amade dike ji bo pêşewaziyê li hatina Mezlûm Ebdê bike". Her wiha li ser gotina General Ehmed Rahal ku bi rojnemavan Ramî Şûşanî re kiriye, dibêje "ji bo ewlekariya Îsrailê, dikarin Mezlûm Ebdê bikin 'Serok an Cîgirê Serokê Sûriyê' jî!
Dema ku mirov bala xwe dide van gotin û kiryaran û şîrove dike, senoryoya Emerîka û hevalbendên wê yên li ser Rojhilata Navîn, hîn zelaltir tên dîtin.
Hema hema gotin û hilwestên Macron jî, mîna rayedarên DYEyê ne; him ji bo nerîn û peywendiyên wî yên li gel hêzên Kurdistanî û him yên li gel rêveberiyên Bexda û Şamê.
Her wiha Wezîrê Derve yê DYEyê Rubio jî dibejê, "hevkariya me li gel Kurdistanê stratejîk e û evder mifteha aramiya herêmê ye" û hwd!
Şandeyek YEyê jî li Şingalê ye.
Wisa diyar dibe ku, di Rojhilata Navîn de Kurdistan dibe navenda piralî ya cîhanî; siyasi, leşkerî, aborî, bazirganî, çandî û hwd.

# 'Desthilata Şamê wê nebe hêza geşkirina aboriya Sûriyê'

**Zana Roj/Qamişlo**

**Gelo biryara cemdandina cezayan li ser Sûriyê bi desthilata Şamê re dikare bibe cihê kêmkirina kirîza aborî a civakê? Şîrovekar û Aborînas Azad Hiso da zanîn ku di ferzkirina Qanûna Qeyserê de tenê gel bû qurbanî û desthilata Şamê wê nebe hêza careserî û geşkirina aboriya Sûriyê.**

Cezayên navdewletî yên li ser Sûriyê komeke tedbîr û qedexeyên aborî ne ku di dema desthilatdariya Beşar Esed de li ser Sûriyê, ji aliyê Yekîtiya Ewropayê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û gelek dewletên din hatibûn ferizkirin. Ev ceza wek bersivek li ser zordariya hikûmeta Sûriyê li dijî sivîlan di dema şerê navxweyî de hatin ku di sala 2011'an de teqiya û heta sala 2024'an berdewam kir.

**Armanc pêşîgirtina li kiryarên rêjîma Esed li ser gel**

Cezayên Amerîkî ji van tedbîrên herî giran û bibandor in ku ew aliyên derve jî di nav xwe de digirt û digihîşte ambargoyeke aborî a giştî. Hêjayî gotinê ye ku ev cezayên Dewletên Yekbûyî weke xwe man heta sala 2020'an, dema ku Qanûna Qeyser ket meriyetê. Armanc ew bû ku rê li ber rejîma Sûriyê bigire ku li dijî welatiyên xwe tundûtûjiyê bikar bîne, û wê ber bi reformên siyasî ve bibe, da ku sedemên bingehîn ên pevçûnê çareser bike.

**2025 ragihandina rakirina cezayan**

Di 13'ê Gulanê de Donald Trump li Riyadê bi awayekî ji nişkêve biryara rakirina cezayan li ser Hikumeta nû a Sûriyê ragihand. Ev biryar li ser daxwaza Mîr ê Keyaniya Erebistana Siûdî, Mîr Mihemed bin Selman hat dayîn. Her wiha yekîtiya Ewropayê di 24'ê hevê de erêkirina li ser vê biryarê di Civîna Meclisa Ewropayê de îlan kirin.

**Sivikirina cezayan piştî erdheja wêranker a 2023'an**

Daxwazên navneteweyî ji bo rakirina dorpêçên li ser Sûriyeyê piştî erdhejên wêranker ên ku di sala 2023'an de li Tirkiye û Sûriyeyê qewimîn zêde bûn. Ji ber ev biryar bandoreke wê mezin li ser hewildanên alîkariya mirovî heye. Li hember vê yekê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hin dorpêç demkî sivik kirin, û rê da hejmarek ji rêxistinên xêrxwazî ku alîkariyên darayî û mirovî ji bo Sûriyê bişînin.

**Siyaseta li ser gelê Sûriyê û bi taybet Kurdan**

Girêdayî vê mijarê şîrovekar û aborînas Azad Hiso ji rojnameya me re wiha axivî: "Rêjîma Esed siyasetek wiya a aborî hebû ku her tim polîtîkeya durxistina civakê ji siyasetê û aboriyê dida meşandin. Tenê di asta ku gel pêdiviyên xwe yên rojane peyda bike û dabara xwe bike bû. Ev yek jî da ku civak dûrî siyaset û xuliqkariyê bike bû. Di 2004'an de bûyerek li Qamişloyê hat rûdan, gelê Kurd serî li hember rêjîma berê rakir. Rêjîma Esed siyaseta pêşnexistina aborî û pêşesaziyê li herêmên Kurda da meşandin, da ku di van herêman de pêşketin çênebin û gel her tim berê xwe bide metrepolan. Ev yek jî bi taybet siyasetekî zirav li ser gel û herêmên Kurdan bû."

**'Gel êşa cezayên Qanûna Qeyserê kişand'**

Azad di berdewamiya axaftina xwe destnîşan kir ku Şoreşa Sûriyê bi bin ket û Qanûnên Qeyserê hatin ferzkirin û got: "Şoreşa ku di Sûriyê de hatiye pêkanîn, bi tu awayî bi ser neket û bû kirêzeke êdî gel rojane bi kiryaran re dima. Ji lewra Dewletên Yekbûyê yên Amerîkayê Zagonên Qeyserê li ser Sûriyê û rêjîma wê ferz kirin. Ev zagon di asta yekemîn de ji bo gel hatin ferzkirin, da ku rê li ber kiryarên desthilata Sûriyê yên li ser gel bê girtin. Lê belê Qanûna Qeyserê di aliyê hikumet û rêveberiyê de her wiha di aliyê leşkerî de tu bandoreke xwe a mezin nîn bû, lê di aliyê aborî de derî li civakê hat girtin û a ku êşa van cezayan kişandine tenê civakên di Sûriyê de bûn."



**'Geşkirina aborî di Sûriyê de nîne'**

Azad Hiso diyar kir ku cemdandina cezayan tu sûdê li Sûriyê nake û got: "Biryara rakirina cezayan ango cemdandina wan ji aliyê dewletên têkildar ve, ev weke şansekê ye ku didin hikumeta nû a Şamê. Lê belê ev yek nayê qebûlkirin, ji ber bi vê gavê bêhtir rewakirina hikumeta nû hat dayîn. Hikumet nû bi vê terzê xwe yê heyî nikare Sûriyê birêve bibe, hey aniha em dibînin ku destdirêjî li ser gelan tê kirin."



# 'Mafê Hêviyê hatiye îmzekirin û divê Tirkiyê bixe meryetê'

Endamê Rêveberiya Insiyatîfa Sûrî ya Azadiya Fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzur da zanîn ku pêngavên ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hatine destpêkirin, bi xwe re encamên gelek mezin li ser asta navnetewî ava kirin. Her wiha Munzur tekez kir ku ji bo gihîştina çareseriyê divê Tirkiyê bi awayekî lezgîn guhartinan di destûr de çêbike.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Bi geşedan û rêveçûnên di Kurdistanê de, banga Rêber Abdullah Ocalan a "Aştî û Civaka Demokratîk", herwiha Kongireya Partiya Karkerên Kurdistan de; hatine dîtin re. Ti gav ji dewleta Tirkiyê girêdayî çareseriya siyasî û azadiya fîzîkî a Rêber Apo de nehatin dîtin. Têkildarî van mijaran Endamê Rêveberiya Insiyatîfa Sûrî a Azadiya Fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzur bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Bi banga Rêber Apo re gelek guhartin hatin dîtin. Di aliyê azadiya fîzîkî a Rêbertî û mafê hêviyê de çima tu gav ji aliyê dewleta Tirk ve nehatine avêtin?**

Di destpêkê de Rêber Apo ji bo çareseriya pirsgirêke Kurd di 27'ê Sibatê de "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" kir. Di vê mijarê de PKK'ê bi hemû tevger û hêza xwe ev banga dîrokî pêşwazî kir û qebûl kir. Li ser wê bingehê Kongreya xwe a 12'emîn li darxistin, bi vê kongrê re biryarên dîrokî hatin dayîn. Yek ji girîngtirîn biryaran jî helkirina heykela PKK'ê û danîna çek bû. Helbet ev her du biryar jî wê li hember wan hin misogerî ji aliyê Tirkiyê ve hebin. Misogeriyên ku erkin li ser Tirkiyê divê pêk bên. Di Banga Rêbertî de jî Birêz Sirri Sureye Under jî di dawiyê de gotiye "Divê zemînê avakirina siyaseta demokrat çê bibe".
Siyaseta demokratîk çawa ye, yanî êdî gelê me rihet karibê rêxistin û partiyên siyasî ji bo nasmane, azadî û hebûna xwe tekoşîn bike. Ya din guhartina destûr bê çêkirin, êdî mafê gelê Kurd di aliyê destur, ziman û rêvebirina herêmên xwe de hebe. Bi vî rengî dikarin guhartinên berbiçav pêk werin, dema ev misogerî û erk bên bicih anîn, wê demê pêwîstiya rakirina çek.. namîne.
Ji vê bêhtir divê em bizanibin biryara hel kirina PKK'ê li gorî pêvajoyê hat dayîn. Dema PKK'ê hatiye avakirin jî li gorî pêvajoya wê demê xwe birêxistin kir. li hemebr siyaseta înkar û qirkirinê rabû. Dunyayek ku ne ev dunya bû, imperyalîst, proleteriya û sosyalîs hebû. Ê niha rewş hatiye guhartin, zihniyet hatiye guhartin, modernîteya kapîtalîst pir pêş ketiye, teknîk, civak û zanist pêşketiye. Bi van rewşan hemûyan re jî divê guhartin bê çêkirin. PKK'ê jî doz anî vê rewşê ku li pêşiya gelê Kurd têkoşîneke nû heye, doza gelê Kurd bi demokrasiyê û aştiyê bê çareserkirin. Naxwa Rêber Apo û PKK'ê tişta li ser milê xwe kirin û gav avêtin. Heya niha dewleta Tirk çawa nêz dibe divê em bibînin. Di aliyê gotin û xîtabê de, pir baş, erênî û bi piştgirî dinirxîne. Lê di aliyê piratîk de weke ku PKK'ê kiriye; wan nekiriye. Dibe ku hinek zemînên hevdîtinên qanûnî ji Rêber Apo re vekiribin, lê ji vê zêdetir bi awayekî lezgînî divê vexwendina perlamanê bê kirin, bi hev re rûnin û gav bavêjin. Heya niha êrişî Herêmên Parastinê yên Medyayê tên kirin. Ev rewş atmosferekî provakasyonê dide avakirin. HPG'ê di gotina xwe de zelal gotibû eger bi vî rengî bidome zimanê ku ew fem dikin, emê bi wê zimanê biaxivin. Di vê yekê re xuya dibe ku rewşa erê û na ye, Tevgera Apoyî amede ne, lê aliyê din hê ne zelal xuya dike.
Ji vê rewşê êdî ev derfetên dawî ne, Rêber Apo viya tekez dike, ger Tirkiyê vê rewşê çareser nekê, wê hilweşandina Tirkiyê bi doza Kurd be, ger temenê dewletê sed sala, nikare sed saleke din berdewam bike, wê dewleta Kurd çêbibe. Divê em bibînin doza Kurdî a guhartin û îstiqrarê di Rojhilata Navîn de ye.
Girêdayî azadiya fîzîkî a Rêbertî em dikarin bêjin ku li gorî tê xwestin Tirkiyê tevnegeriya ye, ji bo tiştekî bibe xwezayî û asayî, Rêber Apo bi gelê xwe re, siyasetmedara re, bi kesên bandor, ragihandin û Raya Giştî re hevdîtin pêk bîne; divê zagon çêbibe. Divê di perlamanê de ev hemû bên nîqaşkirin û zagon nû bibin. Girêdayî Mafê Hêfiyê divê em bizanibin Raya Giştî û Tirkiyê ev yek îmze kiriye, ji ber Mafê Hêviyê di cîhanê de ya herî zêde heyanî 25 sala ye. Rewşa Rêbertî hemû rêgezên navnetewî derbas kiriye. Lê Tirkiyê vê yekê piratîk nake. Beriya salekê DYE, dadgeha Ewropa û Komîteya Wezîran, salek dabûn Tirkiryê. Ê niha tirkiyê mecbûre qanona xwe biguherîne. Her wiha ji Mafê Hêviyê tenê Rêber Apo sûd jê wernagre bi hezaran girtiyên di zêndanan de ku 30 sal derbas kirine j, wê werin serbest berdan.

**Ji bo azadiya fîzîkî a Rêbertî Hemleya demdirêj a "Ji Ocalan re azadî û pirsgirêka Kurd re çareserî" di asta navneteweyî de hat avêtin, ev hemle heyanî niha gihîştiye çi astê û bandora xwe li ser raye giştî û Tirkiyeyê çawa bû?**



Bi rastî hemleya "Ji Rêber Apo re azadê û pirsgirêka Kurd re çareserî" di cîhanî de deng veda, ji hemû netew û welatan her wiha rewşenbîr, hiquqnas, zanyar, profesor, xelatên Nobelê tevlî vê hemleyê bûn û gelek çalakî pêk hatin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çalakiyên di vê çarçoveyê de her berdewam bûn, hemleya îmzeyan, name ji aliyê parêzeran ji bo hemû saziyan hatin şandin, koonferans hatin lidar xistin. Vê yekê bi tayebt hêşt ku çavê dinyayê û a Raya Giştî li ser doza Rêber Apo vebe û nîqaş bikin. Yekîtiya Ewropayê û DYE'yê bi xwe jî gotin divê tecrîd li ser Rêber Abdullah Ocalan bi dawî bibe û mafê azadiyê bê dayîn.
Bi vê hemleyê re gelek guhartinên berbiçav û netewî di aliyê piştgiriya azadiya fîzîkî a Rêber Apo de bi xwe re anî. Mînaka wê jî piştî Koonferansa ku li Îtaliyayê çê bûye gelek welatên Ewropî mafê Hemwelatiyê dan Rêbertî yek ji wan jî Îtaliya bû, hemleyên cîhanî hatin çêkirin. Ê bi van hemleyan re li rex felsefeya Rêbertî a ku bûye felsefeyekî ji bo hemû cîhanê û gelên bindest, êdî Rêbertî ne tenê weke Rêberekî gelê Kurd tê dîtin, feylesof, zanyar, têkoşerekî ji bo hemû gelan e. Ev hemleyên cîhanî û pêşveçûnên ku hatine pêşxistin bandora xwe li ser Tirkiyê û siyaseta wê jî kiriye. Di encam de Tirkiyê çû ber deriyê Îmraliyê, mecbûr ma ku danûstandin bi Rêber Apo re bên kirin. Niha Tirkiyê di rewşa gotûbêjê de ye, ihtîmalek mezin heye ku Tirkiyê danûstandinan (Mufawadata) bike.

**Hemleya "Ez dixwazim Ocalan re hevdîtin bikim". Wê bê destpêkirin girêdana her du kompaniyan û girîngiya wan hûn çawa dinirxînin û erka li ser dewleta tirkiyê çi ye?**

Pêngava yekemîn bi awayekî gelek serkeftî hat destpêkirin û encam girt ku gihîşt encama doza Rêber Apo di asta cîhanî de bê nîqaşkirin û ji zîndanê derkeve her wiha vê pêvajoyê bi rêve bibe. Pêngava "Ez dixwazin bi Ocalan re hevdîtin bikim" berdewamiya pêngava giştî ye. Em bala xwe bidinê ku Rêber Apo zêde meseleyên xwe yên şexsî nade pêş di tevahî hevdîtin û danûstandinan de ev tê dîtin, her dibêje çareseriya di navbera dewleta Tirk û Gelê Kurd e.
Di vê demê û şûnda de divê hemleyên giştî û berfirehtir bên destpêkirin. Hemleyên cîhanî ku piştgiriya felsefe û îdeolojiya Rêber Apo bikin; bên organîzekirin. Ji ber Rêber Apo ji bo guhartina zihniyeta tevahî pergalên heyî têkoşên dike, îdeolojiya Rêbertî îdeolojiyekî cîhanî ye. ji lewra pêwîste ev pêngav neyên sekinandin. Armanca van pêngavan jî ew e ku konferansên mezin li ser asta cîhanê bên amedekirin, xebatên dîplomasê, siyasî, hiquqî, bîrdozî yên gilobal bêne meşandin ku em vê pêvajoyê bighînin asoyê û zextekî li ser Rêxistinên navdewletî û Tirkiyê bidin avakirin. Ji ber êdî Tirkiyê di zûtirîn dem de bi erkên xwe li hemebr Azadiya fîzîkî a Rêber Abdullah Ocalan rabe.

# Ji bo pêşxistina asta sazî û civakê xelekên xwendina parêznameyan

**Meclisa Bajarê Dirbêsiyê bi hevkariya Kongra Star bi armanca piştxistina asta sazî û meclisan dest bi birêxistinkirina şêwirên xwendina parêznameyên Rêber Abdullah Ocalan kir.**

Meclisa Bajarê Dirbêsiyê bi armanca pêşxistina asta endamên meclis û saziyan, bi hevkariya Kongra Star dest bi birêxistinkirina şêwirên xwendina parêznameyên Rêber Abdullah Ocalan kir.
Di her şêwirê de ku 15 rojan dewam dike, têgehên bingehîn ên wekî civaka demokratîk, neteweya demokratîk, sosylojiya azadiyê, têkoşîna exlaq û polîtîk, nîqaş dikin.



Xelekên xwendina parêznameyan bi xwendina pirtûka Sosyolojiya Azadiyê dest pê kir. Der barê mijarê de hevseroka Meclisa Bajarê Dirbêsiyê Raziya Îbrahîm got: "Pêvajoya heyî li gel Banga Aştî û Civaka Demokratîk, vegera li ramanên Rêber Abdullah Ocalan hewce dike. Armanc ew e ku pêkhatina civakê, guhertinên dîrokî ji şerên qebîleyan heya ol, fikirên kapîtalîst, avakirina dewletan û serpêhatiyên civakan bi kûrahî werin fêmkirin."
Raziya Îbrahîm da zanîn ku armanca ji van şêwiran pêşxistina rola saziyên civakî ye da ku bikarin bi têgihiştineke siyasî û exlaqî pirsgirêkên welatiyan çareser bikin.
Raziya Îbrahîm bi domdarî got: "Endamên sazî û meclisan ne tenê karmend in, lê lîstikvanên çalak di pêvajoya avakirina civakan de ne, ji ber vê yekê jî divê xwedî têgihîştinek kûr a xwezaya pirsgirêkên ku mirov pê re rû bi rû dimînin."
Raziya Îbrahîm, bang li hemû beşên civakê kir ku beşdarî şêwirên xwendina pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan bibin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Sekna li hemberî bandorên fikirên kapîtalîst û avakirina civakeke exlaq û polîtîk ji xwendinê, xwefêmkirin û fêmkirina civakê, rewşa dîrokî û siyasî dest pê dike."
Hewl tê dayîn ku şêwirên xwendina pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan li taxan û saziyên perwerdeyê jî werin birêxistinkirin. **ANHA**